

Qîmetên bingehî yên dibistanê, qaîde û qanûna dibistanê

- Hemû kesên ku li dibistanê beşdarbin divê qîmetên bingehî yên ku di qanûna dibistanê de û di wê plana perwerdeyê de hatini beyankirin bi parêzin û tiştê ku li dij wan derkevin red bikin. (qanûn hejmar 11)

Ew tê vê maneyê ku: dibistan divê ji bo qîmetên demokratîk ku qanûna Swêdê li hatîye avekirin kar bike.

- Paragrafa 8'a: ji bo armanca rê li ber girtina cudatîyê û ji bo eyini maf û îmkanên li herema dibistanê piştgirî kirin di qanûna cudatîyê de biryarnama hene (2008:567), zayend, nasnameya cinsî ya xeyrî adetî yan jî îfade kirin, mensûbê qewmek dîn yan jî bawerîyeke din, astengiya fonksiyonî (seqetî), meyla cinsî yan jî temen (emr, çend salî) çî be ferq nake. Qanûn (2014:960).

Ev tê vê maneyê ku: Mafên û qîmetê Hemû keç/xort û jinan /mêran wek heve. Ev ne bi, zayend, nasnameya cinsî xeyrî adetî yan jî îfadekirin, mensûbê qewmekî, dîn yan jî bawerîyek din, astengiya fonksiyonî, meyla cinsî yan jî bi temen ve ne girêdayî ye.

- Paragrafa 6'a Perwerdeya li yekîneya (beşa) dibistanê yan jî li yekîneya pêşdibistanê ku maqamê resmî organîze dike, divê ku ne bi dîn ve girêdayî be (bi dîn ve ne girêdayî be= hêmanên (insûr) dînî divê li vir peyda nebin.)

Bi rê ve birina hemû dibistanên beledîyeyê meqama resmî dike (li beledîyeya Hedemora) û vêca maneya wê, hêmanên li ser dîn peyda nabin. li gor destûrnamê merasima girtina dibistanê, kari

li kilîseya swêdê pêk bê, lê wê dua, berxudarbûn tede tune bin û hwd (û her weha)

- Ku kesek di derbarê cudatîkirinê û/yan jî miameleya rûmet şkenandinê da agahdar bibe, divê ew kes derhal li ba şêfê pêşdibistanê/midûrê dibistanê gilî bike..
Ev tê vê maneyê ku, şêfê pêşdibistanê/midûrê dibistanê divê li ser vê bûyerê bi lez û bez lêkolînê bike û berpîrsiyarê sereke (komîsyona perwerdeyê) agahdar bike.
- **Li her dibistanekê qaîdeyên nîzamî hene, mirov ji salê carekê bi xwendekara re li ser van xebatê dike (kontrol dike). Vêca midûrê dibistanê paşê li ser qaîdeyên nîzamî biryarê distîne.**
- Paragrafa 6'a ji bo ewleyîya xwendekaran û xwendina di revşek aram de yan jî ger xwendekarek bi tevgera xwe rê li nîzaman bigre, midûrê dibistanê yan jî mamosteyek dikari derhal tedbîrên demî (miweqet) bistîne. (qanûna dibistanê). **Ev tê vê maneyê ku xwendekar ji lokala dibistanê kari bê derxistin, dest li ser tiştan(alav, eşya) kare bê danîn, piştî ku têkilî bi dê û bav re hat danîn mirov dikari xwendekar bişîne mal yan jî piştî lêkolînê, ji bo demekê cîyê wî biguherin û bişînin beşek dinî dibistanê.**
- **Li gor qanûna dibistanê ji bo başbûna rewşa zarokê divê dê û bav û dibistan bi hevkarîyê bikin. Dibistan wê li dê û bav guhdarî bike lê dibistan di derbarê qanûna dibistanê û armanca planê perwerdeyê de îstîsna nake. ji bo xwendekarên bi astengiye fonksiyonî (seqet) sebebên taybetî dibe ku heben.**
- Hemû tiştên ku bi nivîsa qalind û stîla îtalîk hatîye nivîsandin, dibin îzahetên qanûna dibistanê û planê perwerdeyê

